Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1069 31-Gulan- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Di Serdema Mîrîtiya Şerefxaniyan De Bedlîs

**Rewşa Avahîsaziyê**

**Di Şerefnameyê de, di serdema Şerefxaniyan de Bedlîs mezin bûye û pêş ketiye. Di bajar de ji kevirên hatiyî tiraşkirî 21 kemer, 8 hemam hebûn. Bedlîs di wê demê de bajarekî mezin bû ku 18 taxên wê yên mezin hebûn.**

Ji bilê vê ku Ewliya Çelebî li gel Melek Ehmed Paşa hate Bedlîsê, di nav kelê de 300 xanî, ji bo veşartina zad û zaxireyê gelek şikeft, xan, hemam û bedestan heyina wan qeyd kiriye. Ewliya Çelebî di nivîsê xwe de di derveyê kelê de 17 tax 5000 xaniyên bibaxçe û bibanî ax cih girtina van jî pê ve kiriye.

Di navbera Tetwan û Bedlîsê de îmareta Rehwayê hebû li wê komên avahiyan hebûn. Ev avahî ji bo rawestina qonaxvegirtina kerwanan bû û li wê zaviyekî bi stûnên bilind, zerîf û zirav hatiyî aliyê de zivistana xwe derbaskir, di havînan de derkete li ser çiyayê, havîna xwe li vir borand. Li ber vê çendê gopika çiyayê keleyek, bi cûr avahî û qeyzeriyek mezin dabû çêkirin. Van deran rûdinişt û wextê xwe yê dirêj lêye derbas dikir, di nav kêf û xweşî, zevk û sefayê de demê xwe borandiye. Lê Xwedê (cc) xezeba xwe li ser aniye û ew çiyaya bilind a 2000 zirî nekêmtir ji nişkê ve hilweşiye, rûniştiye û tebiqiye. 1500 zirî daketiye û çalbûna li ber hilweşînê de goleke mezin çêbûye. Derdora vê golê hema bêje 5 hezar zirî ye. Ava vê golê gelek sar û zeliyayî ye. Lê belê tiştek ecêb jî heye, rexê golê ku tê kulandin avên kel dipijiqe. Erd û zemîn zêdehî bi kevir in. Herî û ax çinîn e. Lewre kevirên reş gel yêk û pêve ne. Ev kevir, wekî kewara mûzê hingivînê tijî û hişk û req in.




çêkirî, hemamek, mizgeftek ku dilê mirovan fireh dike. 10 dikan ji bo senetkar û bazirganiyan, ji bo pêdiviya avê jî kaniyek çêkirî bûn. Bedlîs di s.s. XVII. û XVIII. de hikûmet ve girêdan wîlayeta Wanê bû. Di serî s.s. XIX. de statûya Bedlîs ya hikûmetî berdewam kir û gelheya wê derdorî 12 hezar kes, heta dawiya s.s. XIX. Bedlîs geşedaniya xwe biparêst. Di sala 1838an de Bedlîs gelheya wê kêmzêde 15-18 hezar kes bûn.
Gelek avahiyên rin li Bedlîsê hebûn. Ev avahiyên rind yên Bedlîsê, Ustad û wêjevan Muhemmed Hesen Efendî; bi gotina wiha ev bajar teswîr kiriye, "Bînayê Xusrewane" ne avahiyên vê bajarî. Di bakûrê bajarê, di navbera Mûş û Xelatê çiyayek bi navê "Çiyayê Nemrûz" (Nemrûd)" heye. Gorî baweriya xelkê, Nemrûd di wî

**Mizgeft**

Di dema hikumdariya mîrîtiyê de çar mizgeftên mezin hebûn. Mizgefta Sor (Kızıl Mescîd) di demên fethê îslamê ev dêra Ermeniyan kirine mizgeft. Di dema Selçûqiyan de bi navê Mizgefta Kemn (Cami-i Köhne) hatiye çêkirin. Mizgeftek dî jî heye ku li ser bi nivîsa dîrokî ya "kûfî" hatiye nivîsî ew jî ji aliyê hikumdarê Bedlîsê Emîr Şemsedîn û li ber mizgeftê .
Mizgeftên li Bedlîsê ev in: Mizgefta Mezin, Mizgefta Gokmeydan, Mizgefta Kizil, Mizgefta Şerefiye berhemên girîng ên mirov divê bibînin in. Mizgeftên dî jî ev in: Dortsandik, Aynel Berîd, Şêx Hesen, Alemdar, Kûreyşî, Taş, Xatûniye û Mizgefta Kalealti.

# Hawarek ji Ûrmiyeyê

**Weşanxaneya Nûbiharê pirtûkeke bi Kurmancî ya nû çap kir. Pirtûka bi navê "Îran Xani: Hawarek ji Ûrmiyeyê" ji hêla wergêr Sayime Xakpûr ve hatiye nivîsandin. Pirtûk xwe dispêre serpêhatiyên Îran Xanimê û bi awayekî biyografî hatiye hazirkirin.**




Weşanxaneya Nûbiharê Îran Xanim û her wiha serpêhatiya wê ya bi mane wiha rave dike; "Îran Xan yan jî Îran Xanim, di sala 1951'an de li gundê Îçkeso, navçeya Somabira Dostê, ku ser bi bajarê Ûrmiyeyê ye ji dayîk bûye. Vê jina Kurd a hunermend di dîroka dengbêjiyê de cihekî taybet girtiye. Vê jina berxwedêr û serhildêr, dema ku çi jinekê mafê xwe nedizanî li hember mêrên temen mezin dengê xwe derxîne, dengê dilê xwe û qêrîna ku ji kûrahiya dilê wê derdiket, dikire stran û dengê wê li her derê Kurdistanê belav dibû. Ew yekem jina dengbêje ku di Radyoya Ûrmiyê de dengê wê hatiye qeydkirin û arşîvkirin. Bi vê xebata Sayîme Xakpûr, bi rêya neqilkirina jiyana hunermendeke Kurd, derd û xem, xweşî û hêsir, ken û girî, gazinc û gilî û hewar û qêrînin komek mirovan tê ragihandin. Carina jî hest û hizirên nivîskar jî tevlî ax û nalînên neqilkara pirtûkê ango Gulistana keça Îran Xanê dibin û ta ku merov difikire: Gelo Îran Xan kî bû, dibe ku Gulistana keça xwe be? An dibe ku Sayîmeya nivîskar be? Dibe ku dayîk û xwişkên me bin? Belkî jî hemû civata me..!"

Sudoku: Bersiv 78

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 7 | 9 | 1 | 6 | 3 | 4 | 2 | 8 |
| 1 | 2 | 8 | 5 | 7 | 4 | 3 | 6 | 9 |
| 4 | 3 | 6 | 2 | 9 | 8 | 1 | 5 | 7 |
| 2 | 9 | 1 | 8 | 3 | 6 | 7 | 4 | 5 |
| 7 | 6 | 5 | 9 | 4 | 1 | 2 | 8 | 3 |
| 8 | 4 | 3 | 7 | 5 | 2 | 9 | 1 | 6 |
| 6 | 8 | 7 | 4 | 2 | 9 | 5 | 3 | 1 |
| 3 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 8 | 9 | 2 |
| 9 | 1 | 2 | 3 | 8 | 5 | 6 | 7 | 4 |

Sudoku:Pirs 79

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | | | | 3 | | | |
| 3 | | | 9 | 6 | 4 | | | |
| 5 | | | | | 2 | 3 | | |
| | | 9 | | | | 8 | | 4 |
| 8 | 1 | | | | | | 6 | 5 |
| 7 | | 5 | | | | 9 | | |
| | | 3 | 1 | | | | | 2 |
| | | | 4 | 9 | 5 | | | 8 |
| | | | 2 | | | | 7 | 6 |

## Quncika Têgînan

| Bajarok | 1. Bajarê piçûk. 2. Ji gundan mezintir ji navçeyan piçûktir. |
|---|---|
| Cangorî | 1. Xweşmir, pakrewan, canfeda, xwbexş. 2. Kesê ji bo dozekê jiyana xwe dike gorî, fedayî. |
| Çalakvan | Kesê çalakiyan dike, çalakker. |
| Gef | Gotina ji bo tirsandinê, reşdayîn, tehdîd: Rêbiran gef li gundiyan xwarin. |
| Navçe. | Ji bajêr piçûktir, ji bajarok mezintir. |
| Qad | Meydan, ciyê mezin û fireh: Ji bo şermezarkirina dagîrkeran welatî daketin qadan. |
| Xwepêşandan | Komek mirov ku ji bo şermezarkirina tiştekê li ciyekî helwesta xwe diyar dikin. Xwenîşandan: Ji bo dijberiya bihabûna benzînê welatiyan xwepêşandanek li dar xist. |
| Xweşmir | Şehîd, pakrewan, cangorî. |
| Çalakî | Bizav, xebat, liv, lebat, tevger, hereket, kiryar, kar, kirin: Ji bo bîranîna şehîdan çalakiyek hat lidarxistin. |
| Çalak | Çeleng, jîr, jêhatî, xurt, kêrhatî: Xortên gundê me çalak in |



## Efrîniyên li Şehbayê: Mexmûr ne bi tenê ye

**Koçberên Efrînê li kantona Şehba li Bakûr û Rojhilatî Sûriyê yên ku di bin rêgirî û ambagroya hikûmeta Şamê de ne, hewildana hikûmeta Iraqê ya dorpeçkirina wergeha penaberan Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) şermezar kirin.R-3**

## Ji Moldovayê ber bi Rojava ve



Êlêna Mihemed a ku beriya 20 salan ji Moldovayê berê xwe daye Rojavayê Kurdistanê, bi dildarî û hezkirin fêrî zimanên din dibe. Li gel Ingilîzî û Fransî, ew neha xwe fêrî zimanê kurdî jî dike û dersa bîrkariyê dide şagirtên refên amadeyî.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1069 31-Gulan- 2023 www.ronahi.net/ku/

# TIRKIYÊ BER BI QONAXEKE TARÎTIR VE DIÇE

**Salih Muslim destnîşan kir ku faşîzma AKP/MHP'ê bi rêbazên qirêj û tifaqa li gel mafya, Hîzbûlahê di hilbijartinan de serkeftî xuya kiriye, lê ji hundirve hildiweşe û wê bikeve qonaxeke tarî. Muslim bal kişand ku Kurd tevî hemû êrîşan serkeftî bûne û mînaka xweparastin û pêşengîtiya têkoşîna demokrasiyê careke din nîşan daye.R-5**




## Hawara Jin




Xwinêrên hêja, min di nivîsa xwe ya berî vê de balkişandibû ser Kovara Hawarê û zimanê wê yê zayendperest. Ez ê di vê nivîsa xwe jî, di Kovara Hawarê de rista jinan bigirim dest.**R-7**

## Kar û xebatên Şaredariya Gel A Bajarê Qamişlo



Şaredariya Gel A Bajarê Qamişlo ji bo xizmeta welatiyên bajêr û gundewarên wê, herwiha parastin jîngehê gelek kar û xebatan dide meşandin. Rêveber û endamên Şaredariyê diyar kirin ku ew ji bo xizmeta welatiyan her dem di nava kar û xebatan de ne.**R-6**

## Ji xewna welatekî serbixwe ber bi mîretiyeke malbatî ve R-4




## Kargeha Rohilat derfetên kar ji bona gelek jinan peyda kiriye R-2





PIŞTÎ HILBIJARTINAN ATMOSFEREK GIRAN LI BENDÊ YE!
Dilya Cizîrî R-4



Sembolê Serkeftinê 'V'
Farûk Sakik R-5



Ne bi hilbijartinê Erdogan bi hêza dewletê li ser desthilatdariyê ma
Zekî Bedran R-5

# Ji Moldovayê ber bi Rojava ve

Êlêna Mihemed a ku beriya 20 salan ji Moldovayê berê xwe daye Rojavayê Kurdistanê, bi dildarî û hezkirin fêrî zimanên din dibe. Li gel Ingilîzî û Fransî, ew neha xwe fêrî zimanê kurdî jî dike û dersa bîrkariyê dide şagirtên refên amadeyî.

Êlêna Mihemed a ku beriya 20 salan ji Moldovayê berê xwe daye Rojavayê Kurdistanê, bi dildarî û hezkirin fêrî zimanên din dibe. Li gel Ingilîzî û Fransî, ew neha xwe fêrî zimanê kurdî jî dike û dersa bîrkariyê dide şagirtên refên amadeyî.

Êlêna Mihemed bi eslê xwe ji welatê Moldovayê ye. Ew welatê ku di navbera Romanya û Ukranyayê de ye. Êlêna piştî ku beşa matematîkê (bîrkarî) di zanîngehê de li Moldovayê bi dawî dike, sala 2003'yan tê Rojavayê Kurdistanê. Êlêna Mihemed niha li bajarê Qamişloyê dimîne û her wiha li Dibistana Keramê ya ser bi çar kolanan dikeve, mamostetiyê dike. Êlêna ji sala 2014'an ve mamostetiya bîrkariyê dike û dersê dide şagirtan. Mirov dikare bibêje, ew yek ji wan karên herî zehmet dike, ji ber ku di warê bîrkariya bi Kurdî de kêm kes hene ku vî karî bikin.

Êlêna Mihemed got, dema mirov ji cîhanekê derbasî cîhaneke din bibe, ne tiştekî hêsan e: "Bêguman tu di civakekê de ye, tu hînî teqalîd û zimanê wê dibî. Tu dielimî çand, bawerî û têkiliyên wê jî. Lê hatina welatekî cihê cîhaneke nû ber min xist. Mecbûr bûm ji nû ve fêrî zimanekî din û her wiha li çand û teqalîdên wî welatî bikolim. Ji bo vê jî pêdiviya min bi wext hebû da ku baştir vî welatî nas bikim û karibim lê bimînim."

**Ewilî tengav dibe**

Êlêna Mihemed dide zanîn ku ew bi yekî Kurd re dizewice û bi vî awayî ew berê xwe dide Rojavayê Kurdistanê. Dema li Rojava bi cih dibe, ewilî dixwaze fêrî zimanê Kurdî bibe. Wê da zanîn ku destpêkê zehmetî dîtiye lê bi wextê re pirsgirêk çareser kiriye; "Serê pêşî di warê nivîsandin û devokê de ez tengav dibûm. Lê ast bi ast ez bi pêş ketim, gava ku min sê astên zimanê Kurdî bi dawî kirin, ez hîna nû fêrî ziman bûm. Nexasim jî di warê rêziman de ez hinekî din bi pêş ketim û min mesele ji hev derxist. Min digot qey tîpên li vir tên bikaranîn jî eynî weke yên zimanê min ê Moldovyayî bûn, lê ne wisa bû. Di nivîsandin û axaftinê de ferq hebû. Erê alfabeya Latînî bû, lê di warê rêzimanî de cudahî hebû. Niha jî ez nabêjim, ez gihîştime asteke pir baş, lewma hê jî fêr dibim û lazim e hinekî din xwe bi pêş bixim."

**Têkiliyên civakî û cîrantî li pêş e**



Êlêna Mihemed da zanîn ku ya civaka Moldovayê ji civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê cuda dike, mêvanperwerî ye: "Têkiliyên li vir ji yên li welatê me gelekî baştir in, dilê civaka vir li ser hev e û fikirandinên wan jî wiha ne. Têkiliyên civakî yên vir, hiştin ku ez zû fêrî ziman bibim. Lê li welatê me her kes bi xwe re mijûl dibe û tenê di sînorên çar dîwarên mala xwe de dimînin. Têkiliyên civakî û cîrantiyê pir li pêş in li vir. Ya din jî paqijiya jîngehê, li vir ne wekî li Moldovayê ye, li vir di vê demê de çanda paqijî û xwedîderketina li jîngehê pêşketî ye. Divê em guh bidin xwezayê û xwedî lê derkevin."

**Kurdî fêr bibin û xwedî li koka xwe derkevin**

Êlêna Mihemed girîngiya fêrbûna zimanê dayikê anî ziman û got, Kurdî jî wekî zimanê Erebî girîng e; "Girîng e her netewe zimanê xwe yê dayikê bizanibe, Kurdî jî wekî Erebî girîng e. Li vê herêmê her du ziman jî girîng in ku her kes bizanibe lê dema ku tu Kurd bî, tu neçarî fêrî Kurdî bibî û xwedî li koka xwe derkevî. Bi vê gavê re hem zanist bi pêş dikeve hem jî bîra civakê ya ku ber bi jibîrkirinê ve diçû, zindî dibe û ew bîr dewlemendtir dibe. Bipêşketina civakê bi bipêşketina zanist û ziman ve girêdayî ye. Di pirtûkxaneyan de bi hezaran pirtûk hene ku mirov jê sûdê bigire, bêhtir xwe û çanda civaka xwe nas bike."

**Gihiştina di bîrkariyê de girîng e**

Êlêna Mihemed di warê dersdayîna matematîkê de perwerdekar e. Ew wiha behsa dersa xwe dike; "Pirbûna zimanan û fêrbûna wan bi qasî xweşiya wê, zoriyên wê jî hene. Zimanê min ê dayikê Romanyayî û Rûsî ne. Li dibistanên Moldovayê fêrî van zimanan bûm. Her wiha ez li vir jî fêrî zimanê Kurdî bûm. Wekî din ez bi Ingilîzî û Fransî jî dizanim, lê ewqasî ne şareza me di van zimanan de. Niha ez dersa matamatîkê li dibistanan didim şagirtan, lê belê divê ku ez di warê bîrkariyê de fikrên baş bigihîjînim şagirtan da ku ew di bîrkariyê de pêşbikevein. Ji ber ku matematîk ne tenê qanûn û hesab in, divê ku tu jê fêm bikî û bidî fêmkirin jî. Yanî gihîştina di bîrkariyê de jî girîng e."

Ji xeyalan re wext û derfet divê Êlêna Mihemed di dawiyê de wiha behsa xeyalên xwe dike: "Her mirovek xwedî xeyalekî ye. Xeyalên hin kesan zêdetir in. Ew jî hem wext û hem jî derfet jê re lazim e ku wan xeyalan veguherîne rastiyê. Min dixwest gelekî bigerim, welatan, netewe û rêûresmên wan nas bikim. Heke derfet çêbin ez ê dest bi pêkanîna xeyalên xwe bikim." **NÛJÎNHA**

# Kargeha Rohilat derfetên kar ji bona gelek jinan peyda kiriye

Birûc Resûl/Qamişlo

**Tevî şert û mercên zor û zehmet û dorpêça ku li ser bakur û rojhilatê sûriyê tê meşandin. Kargeha Rohilat a çêkirina zeytûn, zeyta zeytûna û kelûpelên xwarinê, li bajarê Amûdê ji bo peydakirina pêdiviyên herêmê kar û xebatê dike.**

Xelîl Elo yê ku ji xelkê bajarê Efrînê ye, piştî ku di 6'ê Nîsana 2019'an de, di encama şer de kargeha xwe ya pîşesaziyê li Efrînê ji dest da, dest bi avakirina kargeheke zeytûn û xwarinê li bajarê Amûdê kir. Di kargehê de her cureyên zeytûnan çêdikin. Ji derveyî zeytûnan gelek madeyên xwarinê yên mîna ava îsotan û yên din jî têne çêkirin.

**Karê ku di kargehê de tê kirin**

Rêveberê kargehê Xelîl Elo behsa destpêka damezrandina kargehê û mekanîzma karkirinê ya piştî wê kir û wiha got:" Piştî dagirkirina bajarê Efrînê me biryar da, ku em kargeha zeyit û zeytûnan li bajarê Amûdê vekin. Di serî de me xwest ku em sûdê ji zeytûnên heremê bigrin û ji derve zeytûnan nekirin. Her weha ev demeke dirêje ku ez vî karî dikim û beşek ji binesaziya kargehê jî hazir hebû. Ji bona vê




yekê me tu zehmetî di destpêkirina kar de nedît. Derbarê zehmetiyên ku di dema niha de, li pêşiya me dibine asteng, Xelîl Elo diyar kir ku dorpêça li ser heremê raste rast bandora xwe li ser kar û xebata wen dike. Ji ber ku gelek beş û amûrên kargehê ji derve têne peydakirin. Ji van tiştên ku ji derve têne peydakirin mîna keresteyên bingehîn ji bo çêrkirin û şorkirina zeytûnan, ji derveyî Sûriyê û bihayê gihandina van madeyan.

**` Girtina deriyê Sêmalka dibe asteng li ber belavkirina berhemên kargehê `**

Girêdayî berhemên kargehê jî Elo got: Ku berhemên kargehê dighêjin hemî deverên Suriyê, Iraqê û gelek deverên din jî. Lê dorpêça ku li ser herêmê tê meşandin bandoreke neyînî li ser belavkirina berhemên kargehê dike. Her weha baceya ku ji aliyê hikûmeta Şamê ve li ser berhemên ku ji kargehê têne standin rewşa me hîn aloztir dike. Piştî ku deriyê Sêmalka ji aliyê PDKê ve hate girtin, tenê berhemên kargehê di nava sînorên heremê de têne belavkirin û berhemê me di destê mede dimîne."

**` Amûrên xebatê û hijmara karkeran `**

Xelîl wiha berdewamî da axavtina xwe û got:" Kargeh berhemên xwe zêdetirî 2 hezaran dide bazarên hremê, tişta herî baş jî ew e, ku berhemên kargehê li heremê û bi erzanî têne belavkirin. Ji ber ku kelûpelên ku ji derveyî Sûriyê tên bihayê wan buhaye û derfetê gel nîne ku bikre. Hejmara karkerên ku di kargehê de karê dikin derdorî 43 karkerîne û ji wan jî 22 jin in, lê ev hejmar dem bi dem tê guhartin û dema ku berhemê zeytûnan zêdebe karker jî zêdedibin. Ji ber vê Ji ber vê yekê dibe ku hejmara karkeran bighêje 100 kesî. Di her demsalê de 1200 ton zeytûn ji bo depokirinê tê hilberandin. Ji bo hilberîna rojane jî kargeh 4-5 ton zeytûnan amede dike."

**` Daxwaza me pêşxistina kar e`**

Xelîl Elo di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku kargeh hewl dide qada karê xwe bi pêş bixe û zêdetirî hezar karkeran têde bixebite û wiha got: "Em dixwazin di warê zeytûnan de, pêdiviyên heremê temam bikin. Herêm ji aliyê darên zeytûnan ve zengîn e, pêwîstiya me bi madeyên ji derveyê herêmê nîne û em ji bona zêdekirina berhemên zeytûnan kar û xebatê dikin.

**` Hebûna jinan di kargihê de `**

Jina ciwan Eyat Elşewax a temen 20 salî, ku ji koçberên herêma Dêra Zorê ye, li gel xwişk û dayika xwe ya mezin ev zêdetirî 4 salan e, di kargeha Rohilat kar dike. Eyat destnîşan kir piştî ku herêma wan rastî êrîşên herî dijwar ên çeteyên DAIŞ'ê hat, wan berê xwe dan bajarê Amûdê. Li bajarê Amûdê wan jiyaneke aram û derfetên kar di kargeha Rohilat de ji bona xwe peydakirin. Eyat destnîşan kir ku ew ji saat 7`ê sibê heta 5 êvarê kar dike û destheqê wê yê mehane jî 500 hezar lîreyên sûrî ye.

Eyat wiha got:" Li gel ku bi demjimêran em dixebitin, dema ku ez dibînim ku kar bi serkeftî derbas dibe, kêfxweş dibim û ev jî bandoreke erênî li coşa min a kar û xebatê dike. Eyat got ku di kargehê de gelek jinên wek min, ku ji bajarê xwe koçber bûne kar dikin. Kargeh derfetên kar ji bona gelek jinan peydakiriye û bi riya kar û xebata ku dikin asta jiyana xwe baştir dikin. Eyat axavtina xwe bi dawî kir û got:" Em wek jin, dixwazin ku cêh xwe di hemû karî de bigrin. Ji ber ku kar ne şerm e, daxwaza me ew e, ku hemû jin di karê xwe de serkeftî bin.



# Hawara Jin

Xwinêrên hêja, min di nivîsa xwe ya berî vê de balkişandibû ser Kovara Hawarê û zimanê wê yê zayendperest. Ez ê di vê nivîsa xwe jî, di Kovara Hawarê de rista jinan bigirim dest.

Xecê Şen

Belê, dema ku mirov li ser dîroka mirovahiyê û ya gerdûnê lêkolînê dike mirov dibîne ku jinan ji dîroka mirovahiyê û heta niha berxwedêriyeke bêhempa daye meşandin, di her serdemê de berxwedêriya xwe jî jîndewer kiriye û her tim ji bo civaka mirovahiyê jiyaneke nû afirandiye. Ev jîndewerî hem di warê felsefî û hem jî di warê zimanî û perwerdehî ve civakbûyînekê nû avasazkiriye û parastiye.

Bêguman di heqîqeta kurd û Kurdistanê de û taybet jî di heqîqeta dîroka jinên kurd de jî ev her wisa bûye. Anku jinan di her serdemê de di gelek waran de têkoşiyane, di guhertin û veguhertina civakî de risteke mezin lîstine. Ji dîroka mirovahiyê û heta dîroka Kurdistanê yên ku li dijî zilmê û her cureyên desthilatdariyê mêrsalariyê serî rakirine û têkoşiyane bêguman jin in. Her çiqas di encama polîtîkayên şerên taybet ên ku dagirkeran li ser jinan hatibe meşandin û di



encamê qirkirin-qetilkirin, pişaftin û biyanîbûn hatibe jiyîn jî, lê dîsa jî jinan di fersenda yekemîn de li dijî her cure qirkirin, pişaftin û biyanîbûnê têkoşiyane, şer kirine û ala berxwedanê bilindtir kirine. Her wiha bi rûhê berxwedaniya jinan tovê vejînê reşandine û di herikîna jiyanê de jîndewer bûye. Anku jin di hemû serdem û pêvajoyan de bûye hêza herî xurt a serhildan, berxwedan û bilindkirina têkoşîna azadiya civakî. Em çanda vê berxwedêriya azadiya jinan carînan di rêzikên helbestên Mestûre Kurdistanî, carînan jî di roman sembola berxwedana mala Eliyê Ûnis, Rindê Xanê de dibînin.

Bêguman ji dîroka berxwedêriya jinan yek jî ronakbirî û rewşenbîriya jinan e. Dema ku mirov li ser dîroka ronakbîrî û rewşenbîriya jinan lêkolîn dike, di kûrahî û hûrahiya wê de diçe, mirov dibîne ku jinan di gelek mekanîzmayên ronakbîrî û rewşenbîriyê de cih girtiye û bi rê ve biriye. Hêjayî gotineyê ku Kovara Hawarê jî ji wan mekanîzmayan yek e. Jinan di rêveberiya Kovarê de cih girtine û bûne hawara jinan a pênç hezar salan. Her wiha gelek jinên weku Rewşen Berdirxan, Dilîstan, Evîn Cîweleq û Şêbistan ji bo pêşxistin û pêşdebirina zimanê kurdî, di avakirina lîteratora wêje û rewşenbîriya kurdî ya neteweyî û navneteweyî de risteke mezin lîstine û xebatên pir pîroz kirine. Ev jî dide xuyakirin ku di Kovara Hawarê de û nivîskariya wê de tene mêran tê de cih negirtine, ronakbîrî û rewşenbîrî nekirine. Di heman demê de jinan jî cih girtiye, ji bo guhertin û veguhertina hişmendiya civakî risteke mezin a pêşengitî û rewşebîrî lîstine. Dibe ku di hêla hejmarî ve (nicelik) kêm bin, lê dema ku mirov nivîsên wan dixwînê mirov dibîne ku ji aliyê fikir û hizrî ve xwedî hêzeke pir bi (nîtelîk) xûrt dibîne.

Lê mixabin di Kovara Hawarê de ew ked û xebatên jinan ji bilî çar nivîsan pêvetir xuya nake. Lewra ji destpêka dîroka ronakbîriya Hawarê û heta niha dema ku nirxandin, şîkar û şîrava li ser hatine kirin, her tim weku avakar, berpirsiyar, pêşeng, ronakbîr û rewşenbîr mêr dane xuyakirin û derxistine pêş. Anku şîkar û şîravayên ku li ser Hawar û dahûrandina wê hatiye kirin hemû li ser hişmendiya mêran bûye. Weku hemû kar û xebat mêran kiribe, ronakbîrî û rewşenbîrî wan bipêşxistibe tê xuyakirin. Bi kurtasî rûyê şênber ê Hawarê hişmendiya mêran e.

Her weku me li jor jî daye xuyakirin, dema ku mirov li xebatên jinan ên li ser ziman û wêjeyê yên di sala 1930-1932-1933an de dinihêre mirov dibine ku jinan di wan salan de jî gelek xebatên hêja û pîroz kirine. Taybetî ji bo pêşxistin, pêşdebirina Hawarê gelek kar-xebatên pir bi wate dane meşandin û nivîskarî ji Hawarê re kirin e. Dema ku mirov bi baldarî Kovara Hawarê dixwîne mirov vê yekê hê baştir dibîne û fêm dike. Bi rastî jî dema ku mirov di kovareke wisa xwerû bi Kurdî de reng, deng û pênûsa zêrîn a jinan dibîne mirov bêhtir bextewertir dibe. Anku jinên wek Rewşen Berdirxan, Dilîstan, Evîn Cîweleq û Şêbistan li ser gelek mijarên weku dîroka Kurdan, beşên wêjeyê yên weku helbest, çîrok, meselok, Jin û hwd. Di Hawarê de nivîsîn e. Ev ji bo pêxistin û pêşdebirina nîvîskarî, ronakbîrî û rewşenbîriya jinên Kurd zor girîng e. Bêguman bi ked-fedekariya wan jinên pîroz asta têkoşîna azadiya jinan, asta ilim û zanyariya jinên Kurd hat bilind kir û îro gihişte zanista jinan a bêhempa ya Jineolojiyê ye.

**Çavkanî: Hemû hejmarên Kovara Hawarê ya ji weşanxaneya J&Jyê**

# 'Bi rêya wênesaziyê mirov hestên xwe nîşan dide'

Norşîn Sîno / Qamişlo

**Wênesaza ciwan ya Kurd Nazlîn Celal Eldîn da zanîn ku bi rêya wênesaziyê mirov dikare hestên xwe nîşan bide û got, piştgiriya malbata min ji min re bû bingeha serkeftinê.**

Wênesazî ,yek ji girîngtirîn hunerên bedew e ku ji bo nîşandana hest û nakokiyên hundirîn yên di nava mirovan de, tê bikaranîn. Ji ber ku wênesazî giyanê mirovî yê veşartî îfade dike û tiştên ku di hundirê wê de ye ji hezkirin, êş, veqetîn, hesret û hestên din vedibêje. Gelek bûyerên girîng jî derdixe pêş, îfade dike û nemir dike. Nazlîn jî yek ji wênesazên Kurd e, wê ji zaroktiya xwe ve hewl da ku hestên xwe herwiha astengî, kêf û xweşiya jiyana xwe bi wênesaziyê derxe holê û heta niha jî ew berdewam dike.

**' Ji ber îmkanên kêm rismên hêsan xêz dikir '**

Nazlîn Celal Eldîn ciwana kurd ya 24 salî , ku ji bajarê Dirbêsiya yê Rojavayê kurdistanê ye , diyar kir ku wê ji biçûkaniya xwe ve ji wênesaziyê hez dikir , herwiha di wê demê de Ji ber derfetên wê yên qels û temenê xwe yê ciwan rismên hêsan xêz dikir .Piştî çend salan ji xêzkirina wêneyên wê dest bi xêzkirina hinek wêneyên giran kir wek xweza, lawir û her wekî din her wiha di peymangeha Hunerên Bedew de dest bi xwendinê kir ,da ku karibe xwe pêş bixe ji ber ku di nerîna wê de mayîna di qonaxên wênesaziyê yên hêsanî de pêşketin çênabe.

**'Bi rêya wênesaziyê mirov dikare hestên xwe nîşan bide'**

Nazlîn dazanîn ku ew bi rêya wênesaziyê hestên xwe nîşan dide, herwiha piraniya tabloyên wê êşên ku ew rû bi rû di jiyana xwe ya kar herwiha ya taybet de dibîne , derdixe holê û got: "Di kesayeta her mirovî de rewşên jiyanê yên taybet heye , ku di jiyana xwe ya rojane de rastî gelek pirsgirêkan dibe û her mirovek jî rewşên xwe bi rengekî dedixe holê. Ez jî astengî herwiha rewşên ku ez têde derbas dibim bi rêya wênesaziyê nîşan didim û hindurê xwe vala dikim da ku ez aram bibim".

**' Piştgiriya malbat ê bingeha serkeftinên mirov in '**

Destpêkirina her karekî mirov rastî zehmetiyan tê û dibe ku bibe sedema şikestin û teslîmkirina



mirov , ji ber vê piştgirî roleke pir girîng di vî milî de dileyize, da ku bibe rêya xurtkirina mirov .Malbata Nazlîn bi taybet jî birayê wê jê re bûna jêdera piştgiriyê û jê re rêya serkeftinê ji keleman paqij kirin. Ji bo pêşxistina Nazlîn , malbata wê derfet danê ku ew li gel mamosteyek ji bo fêrkirina wênasaziyê xwe fêr bike, herwiha hemû amûrên ku ji bo wênesaziyê pêwîste peyda kirin. Nazlîn dibêje: "Piştgiriya malbata min bingeha serkeftinên min in " .

**'Ji bo pêşxistinê tevlîbûna pêşengehan girîng e'**

Nirxandina kar ji aliyên pisporên wî karî ve gaveke girînge, ji bo pêşxistina destpêkeran .Derbarê wênesziyê jî gelek pêşengeh , çi ji aliyê Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser yan jî ji aliyê saziyên taybet yên Elaqedarî wênesaziyê ve çêdibin , tê de wênesaz tabloyên xwe pêşkêş dikin û wêneyên wan ji aliyê Komîteya nirxandinê ya ku endamên wê pisporên wênesaziyê ne , têne nirxandin . Nazlîn di rêya tevlîbûna di pêşengehan de, nirxandinên komîteyên nirxandinê ji xwe re dike hêz û xwe pêş dixe , herwiha diyar kir ku ew heta niha tevlî çar pêşengehan bûye . Mezintirîn pêşengeha ku ew tevlî bûye 'Hevdîtina Rojava a Çaremîn ya Hunera Şêwekariyê ' ya ku ji aliyê Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hevkariya Desteya Çandê ya Herêma Cizçrê , li bajarê Qamişlo hate li darxistin. Nazlîn bi tabloya xwe ya ku nameya wê êşa jinan di civakê de , beşdarî vê pêşengehê bû û ew ji bo beşdarbûna xwe pir kêf xweşe.

**'Rola mamosteyên wênesaziyê ji bo şagirtan roleke sereke ye'**



Rola mamosteyên wênesaziyê ji bo şagirtan roleke sereke ye ji ber ku şagirt di destpêkê de dikeve gelek şaştiyan herwiha astengiyan jî dibîne, ji bo derbaskirina wan herwiha ne teslîmkirina li hember wan mamoste pêwste . Nazlîn diyar kir ku ew jî despêkê de eynî pirsgirêk derket hola karê wê û bi rêya mamosteyê xwe ew derbaskir , da ku gihişte vê astê.

**'Heta ku mirov xewnên xwe pêk bîne, berxwedan pêwîste'**

Wênesaza Kurd Nazlîn Celal Eldîn nameyek ji bo Şagirt û hezkiriyên wênesaziyê pêşkêş kir û wiha got: " Nameya min weke wênesazeke kurd ji bo şagirt û hezkiriyên wênesaziyê ku bi cesaret li berxwwe bidin li berxwe bidin da ku xewnên xwe bi cih bînin , ji ber ku her tişt bê westandin û berxwedanî pêk nayê , herwiha xewnên ku bi hêsanî pêk tê tama wan nîn in " .

# Kar û xebatên Şaredariya Gel A Bajarê Qamişlo

Şaredariya Gel A Bajarê Qamişlo ji bo xizmeta welatiyên bajêr û gundewarên wê, herwiha parastin jîngehê gelek kar û xebatan dide meşandin. Rêveber û endamên Şaredariyê diyar kirin ku ew ji bo xizmeta welatiyan her dem di nava kar û xebatan de ne.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê û damezrandina Rêveberiya Xweser, xebatên Şaredartiyê ku yek ji lingên bingehîn yên sîstema Rêveberiya Xweser e jî, roj bi roj pêş dikevin. Yek ji bajarên ku ev xebat lê têne meşandin jî Qamişlo ye.




Taybetmendiya Qamişlo ew e ku bajarê herî mezin ê Rojavayê Kurdistanê ye. Şaredariya Gel Ya bajarê Qamişlo di dawiya meha Îlonê ya sala 2012'an de hatiye avakirin. Şaredariyê xebatên rêvebirin û pêşkêşkirina xizmetguzariyên civakê yên weke ekolojî, paqijî,sîstema riyên bajar û gundewarên wê û gelek karên din bênavber dide meşandin.
Şaredariya bjarê Qamişlo jî weke hemû şaredariyên bajar û navçeyên din yên bakur û rojhilatê Sûriyê, ji bo parastina ekolojî û pqijiya bajêr, herwiha rewşa av, rê û kolanan, rojane kar û xebateke mezin dike. Şaredarî li gorî derfetên xwe pirojiyên xizmetguzariyê yên ji bo gel pêk tîne.
Di derbarê kar û xebatên Şaredariya Gel ya Bajarê Qamişlo, berpirsên Nivîsgeha Paqijî, Ekolojî û ya Pirojeyên Şaredariyê ji Rojnameya Ronahî re axivîn.

**'315 karker û 35 erebeyên paqijiyê di xizmeta gel de ne'**

Endamê Nivîsgeha Cîbicîkar ya Şaredariya bajarê Qamişlo, Emîn Cedû` diyar kir ku hemû karkerên beşê paqijiyê û erbeyên wê, roja-



ne 3 caran ji bo paqijiya bajêr kar dikin û wiha got: "Paqijiya bajarê me, erkeke destpêkê dikeve ser milê şaraedariyê, lewma me 315 karker û 35 erebe ji bo paqijkirina bajar erkdar kirine. Herwiha karker û erebe bi giştî rojane 3 caran ji bo paqijiya bajarê Qamişlo, di destpêka sibehê, nîvro û êvarî de derdikevin nav bajêr û kar dikin. Karê ku em rojane dikin dikeve xizmeta bajar û rewşa ekolojiyê, herwiha gel ji niexweşiyan diparêze."

**'Paqijkirina bajêr erkê welatiyan e jî'**

Emîn Cedû` di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku tevî paqijiya bajar erka şaredariyê ye, lê ev erk dikeve ser milê welatiyan jî û wiha axivî: "Me îsal 250 selikên paqijiyê li gelek cihan li bajarê Qamişlo belav kirin, berî niha jî selikên paqijiyê li bajêr hebûn. Herwiha armanca me zêdekirina hejmarên selikên paqijiyê ye, da ku welatî bi hêsanî çopê bavêjne wan selikan. Cihê mixabîniyê ye ku hin welatiyên me van selikan bi awayekî ku weke tê xwestin bi kar naynin û bi me re nabin alîkar. Herwiha rewşa bajarê me çand û hişmendiya me diyar dike, lewra banga me ji welatiyên me re ew e ku erka paqijkirinê bigirin li ser milên xwe jî û bi me re alîkar bin, an jî em ê li her kesên ku bajarê me qirêj dike, cezayên madî li wan bibirin."

**'Hebûna daran rewşa ekolojî diparêze'**

Heseroka beşê Bexçe û Çandina Daran ya Nivîsgeha Ekolojî, Nûşîn Ibrahîm da diyarkirin ku bi çandina daran li bajarê Qamişlo, jîngeh zêdetir xweş û saxlem dibe û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Rewşa hewayê ya bajarê Qamişlo xeternak e, ji ber ku dûmana erebe, jenetor



û hwd… bandoreke neyînî li rewşa jîngehê dike û ev yek jî dibe sedema ku gelek nexweşî bi mirovan re çêbibe. Herwiha em di vî warî de haydar in û salan e bi hezarê daran li gelek deverên bajêr weke dibistan,bexçe, di navbera riyên serke de û li gelek cihan diçînin û guh didin wan daran. Di heman yekê de jî divê ku welatiyên bajarê Qamişlo jî jîngehêbiparêzin, daran biçînin û guh bidin wan."

**'Pirojeyên me yên parastina jîngehê berdewam in'**

Nûşîn Ibrahîm da zanîn ku îsal ji bo parsatina jîngehê gelek piroje li bajarê Qamişlo hatin kirin, hin piroje hîn jî bedewam in û wiha domand: "Bi hevkariya Desteya Ekolojî û rêxistinên cuda, me îsal li baxçeyê Şehîd Devrem,Taxa Siryan, Gel, Şehîd Mihemed, Giştî, Goristana Şehîd Delîl Saroxan, Qada Hîmo ya Newrozê bêtirî hezar darî çandin. Di heman demê de jî niha pêvajoya me ya guhdana bi daran û parastina wan ji nexweşiyan û paqijiyê jî berdewam e. Herwiha pirsgirêka me ji bo avdana darên ku li bajêr hatine çandin niha di bikaranîn sehrîcên avê de heye, avdana darên di munsfan de, bi sehrîcan gelekî demê dix-



we, lewma em niha hewl didin ku di pêşerojê de, sîstema avdana dilopikî bi riya xertûmên avê li hin munesfên riyên bajêr çêbikin. Herwiha em dema daran diçînin gelekî astengiyan di warê kolandinê de dibînin, lewma em bang li cihên beriprsiyar û rêxistinan dikin ku alavên kolandinê yên nû ji me re pêşkêş bikin."

**'Derengmayna wergirtina mîzaniyê pirojeyên me dereng xistin'**

Berpirsê Nivîsgeha Lêkolînê ya Şaredariyê Hesen Hisên jî, da xuyakirin ku pirojeyên hatibûn pilankirin, ji ber derengmayîna mîzaniyê heta niha nehatine destpêkirin û wiha got: "Sala derbasbûyî me di meha 5`an de dest pirojeyên ziftkirin û danîna beqaya û hwd..kir, lê îsal hinekî derng ma, herwiha sedem jî derengmayîna hatina pere û diravan bû, ango derngmayîn ji gel Desteya aborî ya bajarê Qamişlo bû. Derfetên diravî yên ku ji bo pirojeyên çêkirina kolanan hatine veqetandin, 540 hezar dolar e. Hêjayî gotinê ye ku me niha amadekariyên xwe ji bo ziftkirina 18 taxên bajarê Qamişlo kirirne û wê di destpêka meha 6`an de, her taxek derdora 5 kolanan bên çêkirin."

# Yek ji kevintirîn bazarên bajarê Qamişlo bazara Ezra ye

**Navenda nûçeyan**

**Bi dehan bazar li bajarê Qamişlo hene, lê ya herî kevn bazara Ezra ye, ev bazar ji destpêka avabûna Qamişlo ve hatiye avakirin. Firoşkarên bazarê diyar kirin ku li vê bazarê gherî zêde biharat, hingiv û dermanên xwezayî tên firotin.**

Kuçe û kolanên wê bi keviran hatine reqaftin, dora wê xaniyên ji kerpîçan in. Ev der sûka Cihûyan e. Li bajarê Qamişlo, gava mirov dikeve sûka Cihûyan ya kevin 'EZRA' ji her alî ve bêhna baharatê tê.
Bajarê Qamişlo sala 1926'ê gava dest bi xebata danîna riya trênê ya kompaniya Toros dikin ji bajarê Nisêbînê tê veqetandin. Li bajêr şêniyên wê piranî Kurd in û li gel Kurdan Ereb, Suryan û Ermen jî şêniyên vî bajarî ne. Çarsûya Ezra ye ji roja bajar hatî danîn




heta îro cihekî sereke yê bazar û danûstandina şêniyên bajêr e. Dikan û firoşgeh bi kerpîçan hatine çêkirin, rê û rêbiwar bi keviran hatine danîn û bêhna baharatê ji devê kolanan bilind dibe. Ji ber wê mirov dikare bêje bazara Cihûyan Ezra hê jî kevnariya xwe ya resen diparêze.
Derbarê bazar Ezra firoşkarên bazarê ji Rojnameya me re axivîn. Firoşkarê bi navê Kerem Qewas yek ji kevntirîn firoşkarên bazara Ezra ye, ew di bazara Ezra de demeke dirêj derbas kiriye, ew ji beriya 45 salan ve li vê bazarê kar dike.

**`Bazara Ezra bi destê cuhuyan hatiya avakirin `**

Kerem qewas derbarê avabûna sûka Ezra wiha got: "Di navbera salên 1915 û 1916`an de, ev



bazar hatiya avakirin, her wiha ev bazara herî kevnar li bajarê Qamişlo ye. Ev bazar bi destê cuhuyan hatuya avakirin, yekemîn kesê ku bi vî karê rabû kesê bi navê Ezra bû, ew bi karê etariyê rabû. Ji ber ku berî dermanên kîmyayî tune bûn, welatiyan ji bo tedawiya nexweşiyan berê xwe didan dermanên xwezayî, ev dermanên xwezayî jî li bazara Ezra dihat firotin. Di wê demê de Ezra di çêkirina dermanên xwezayî de jêhatî bû, pir mirov li ser destê wî hatine dermankirin. Ezra dermanên xwe belav dikir, herwiha zarokên xwe fêrî



çêkirina dermanan kir, heta roja Îro ev kar berdewam e.

**` Berê li vir benêr, mast û hirî dihat firotin**

Firoşkarê bi navê Nûredîn Ernasî jî derbarê bazara Ezra de wiha got: "Ev 30 sal ez li bazara Ezra kar dikim. Ev bazar pir kevnar e ku hemû dikan ji axê hatina avakirin. Bazara Ezra ji bazarên herî kevn ên Qamişlo ne, niha bi bazara biharat û dermanên giyayî tê naskirin , berê gelek tişt li vê bazarê hebûn, wekî firoştina benêr, mast û hiriyê."



# Efrîniyên li Şehbayê: Mexmûr ne bi tenê ye

Koçberên Efrînê li kantona Şehba li Bakûr û Rojhilatî Sûriyê yên ku di bin rêgirî û ambagroya hikûmeta Şamê de ne, hewildana hikumeta Iraqê ya dorpeçkirina wergeha penaberan Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) şermezar kirin.

Artêşa Îraqê ji 20 Gulanê de hewl dide derdorê wargeha Mexmûrê penaberan Şehîd Rustem Cudî (Mexmûr) a ku 4 sal in di bin rêgirî û ambargoya PDK'ê de ye bi têlan û kuleyan dorpêç bike. Jinên Efrînî yên piştî ji aliyê dewleta Tirk ve dagirkirina Efrînê neçar man koç bikin û bi mehan e di bin ambargo û rêgiriya hikûmeta Şamê de ne, li dijî helwesta Irawê ya dorpêçkirina wargeha Mexmûrê helwesta xwe anîn ziman û gotin, "Mexmûr ne bi tenê ye."

**'Armanca dewletan têkbirina vîna gelan e'**

Hîdayet Elî a ku ji Koçbera Efrînê li kampên kantona Şehba li Bakûr û Rojhilatî Sûriyê dijî got ku êrişên li ser wargeha Mexmûrê li dijî dijî vîna gelan e û bi van gotina nerazîbûna xwe anî ser ziman: "Hêzên desthilatdar dixwazin gelan ji herêmên wan koçber bikin û penaber bikin û piştre bi hemû rêbazan şerê wan bike. Ev dorpêça hikumeta Îraqê jî mînaka wê ye. Li gel kiryarên hikumeta Şamê û siyasetên xeniqandina koçberên Efrînê li Şehbayê, armanca dewletan yek e ku vîna gelan û projeya Netewa Demokratîk têk bibe. Gelê Mexmûr ewqas sal in li ser bingeha projeya Netewa Demokratîk di kampê de dijîn, lewra siyasetên dewletên kapîtalîst desthilatdar razî nabin ku herêmên berxwedêr û li ser bingeha dadwerî, wekhevî û demokratiyê xwe birêxistinkirî armanc digire. Em ne şerxwaz û xwînrêj in armanca me jiyaneke aştiyane wekhev e, dema em tên armancgirtin wê demê mafê me ye ku parastina xwe û rûmeta xwe bikin."



**'Berxwedana gelê Mexmûrê berxwedana me ye'**

Roşîn Xelîl a ji xelkê Efrînê ye dorpêça hikumeta Iraqê ya li ser wargeha Mexmûrê ferz dike şermezarkir û wiha got: "Êşên koçberên Efrînê û Mexmûrê yek e. Ji 5 salan ve em di kampên penaberiyê de dijîn hemû êş û zehmetiyên hikumeta Şamê û dagirkeriya Tirkiyê bi me dikin em dikişînin. Lewma em bi êşên gelê Mexmûrê dihesin û kiryarên hikûmeta Iraqê dijî wan em napejirînin. Berxwedaniya gelê Mexmûrê berxwedaniya me ye, bi yek rihê em ê kiryarên li dijî me dikin berxwe bidin, di pêkanîna azadî û dadweriyê de hemû zehmetiyên jiyanî derbas bikin da ku em bighêjin armanca xwe."

**'Dive hikumeta Iraqê raweste'**

Zozan Hebeş jî siyaseta hikûmeta Iraqê ya li hemberî xelkê Mexmûrê şermezar kir û got: "Ger hikumeta Îraqê dorpêça xwe li ser kampa Mexmûrê berdewam bike gel dê karaseteke mirovî mezin jiyan bikin, lewra divê destwerdaneke navnetewî hebe û hikûmetê raweste."

**'Gelê Mexmûrê ne bi tenê ye'**

Heyat Hesen jî nêrînê xwe anî ser ziman got: "Dorpêça kampa Mexmûrê a ji aliyê hikumeta Iraqê ve karekî ne mirovî ye û dorpêç li ser hemû gelê Kurd e. Mexmûr û xelkê xwe ne bi tenê ne hemû gelên azadîxwaz li pişt wan in, bi vê siyasetê hikumet nikare hebûna gelê Kurd têk bibe ji ber ku vîna gelê Kurd ji hemû planên wan bihêztir e." **JÎNHA**

# HBDH: Em têkoşîna şoreşa yekbûyî mezin bikin

**Komîteya Rêveber a HBDH'ê bi wesîleya salvegera raperîna Gezî daxuyaniyek da û bang kir ku li dijî faşîzmê bi ruhê Gezî têkoşîna şoreşa yekbûyî mezin bikin.**

Komîteya Rêveber a Tevgera Şoreşê ya Yekbûyî ya Gelan (HBDH) di salvegera berxwedana Gezî de daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de hate gotin, "Beriya niha bi deh salan serhildaneke nû û bi heybet li dîroka têkoşînê ya bindestan dihate neqişandin. Vê carê bi milyonan mirovî li Tirkiye-Bakurê Kurdsitanê bi dirûşma 'Ev hîn destpêk e, têkoşîn dewam dike' qad û kolan bi dest dixistin. Qîrîna raperînê ya gelan ji Gezî destpê kir û heta bi Hatay, Enqere, Îzmîr, Dersim, Amedê pêl bi pêl belav dibû. Çalakiya yekbûyî ya serhildêrên li dijî zilmê, tirsa serweran mezin dikir, dibû hêvî ji gelên cîhanê re. Li dijî zext, tepisandin û dorpêça tirsandinê ya faşîzmê, hêrsa li nava girseyan mezin bû, bi Gezî re vediguherî berxwedaneke bêhempa. Daxwaz û hesreta bindestan a ji bo cîhaneke cuda, bi açlakiya bindestan dihate bilêvkirin. Bi Berxwedana Gezî re hate dîtin ku înîsiyatîf û afirîneriya şoreşgerî ya girseyan dikare çi bi ser bixîne; komunên hatin avakirin, meclîsên taxan, forûmên taxan tecrûbeyeke girîng a rêxistinî afirand. Gezî girîngî û mecbûriyeta şerê şoreşgerî ya ji bo têkbirina sîstema heyî careke din raxist pêş çavan, di pêşvebirina şerê şoreşgerî û mezinkirina wê de serdemî bû.
Girîngiya pêwîstiya bi şoreşa yekbûyî, çalakiya yekbûyî ya gelan nîşan da û wezîfe da pêşengên şoreşê. Tevgera me ya şoreşê ya yekbûyî bi vê wezîfe û berpirsyariyê rabû, hewl da bersivê bide daxwazên girseyan û pêwîstiyên şoreşê. Berxwedana Gezî, bû gaveke girîng di rêya HBDH'ê ya rizgariyê de, tevgera me ya şoreşê ya yekbûyî jî li gorî daxwaza şoreşê ya gelan tevgeriya. Ne deh sal lê bi dehan




sal jî di ser re derbas bibin, Geziyê dersên gelekî girîng pêşkêş kiriye ku tecrûbe jê dikare bê hînbûn.
Gezî di sala 10'an de jî tirsa faşîzmê mîna 10 sal beriya niha mezin dike. Desthilatdariya faşîst di şexsê darizandinên Gezî de hewl dide bi milyonan mirovî bitepisîne, bitirsîne. Lê belê li gel ewqas hewldan, polîtîkayên zext û tepisandinê, bi dehan komkujiyan jî, bêencam ma. Çawa ku bi komkujiyan û êrîşên giran pêşî li mezinbûna raperîna li Gezî nekarî bê girtin, îro jî ti êrîş nikare pêşî li yekbûna hêrsê ya bi raperînê bigire.
Ji ber ku girseyên ku li birçîbûn û xizaniyê hatine mehkûmkirin, jinên her roj têne qetilkirin, nasnameyên zayendî yên bindest ên mafê jiyanê ji wan re nayê naskirin, netewe-ya Kurd a dibe armanca qirkirinê, bawerî, ciwan, karker û kedkaran hîn Berxwedana Gezî ji bîr nekirine. Û wê ji bîr nekin; ku dema bûn yek, dema rabûn ser piyan, dema li ber xwe dan digihêjin hêzeke bi çi rengî. Wê bi bîr bînin û li dijî zilma harbûyî bêdeng nemînin, wê hêrsa xwe bi daxwaza bidestxistina paşerojê bigihînin qadan, li dijî faşîzmê bi hevgirtî li ber xwe bidin. Gezî li dijî mêtingerî, zext, êşkence, dagirkerî û dorpêçiya faşîst a topyekûn banga şerê şoreşgerî, rêxistinî, têkoşîna yekbûyî, berxwedan û çalakî ye. Gezî îrade û biryardariya ji bo qezençkirina siberojên azad e. Divê banga Gezî îro hîn baştir bê fêhmkirin û bersiv jê re bê dayin. Rêya esasî ya vê yekê jî pêşvebirina têkoşîna şoreşê ye, mezinkirina şerê şoreşgerî ye. Bi têkoşîneke li nava sînorên sîstemê ev sîstem nayê hilweşandin, rizgariya gelan pêk nayê. Bêyî dayina berdêlan paşeroj nayê qezençkirin. Têkoşîna ku di Berxwedana Gezî û piştî wê de hate kirin û berdêlên hatin dayin, nîşaneya şênber a vê rastiyê ye."

Di dawiya daxuyaniyê de şehîdên Nûrheq û Berxwedana Gezî bi rêzdarî hatin bîranîn û hate destnîşankirin ku ji bo bîranîna şehîdan wê têkoşîna xwe ya şoreşê ya yekbûyî mezin bikin, agirê raperînê bi ser bixînin, kelehên faşîzmê hilweşînin."**ANF**

# KNK di salvegera Peymana Lozanê de amadekariya kongreyek nîştimanî dike

**Endamê Kongreya Netewî ya Kurdistanê Şoreş Xidir diyar kir ku dema wê hatiye di sedsaliya Lozanê de Kurd dijî peymanê bibin xwedî yek helwest û bibin yek. Xidir got; "Ji bo vê em dixwazin di 22-24'ê Tîrmehê de li Lozanê kongreyek nîştimanî û mezin lidarbixin."**

Tê payîn bi boneya salvegera 100 saliya Peymana Lozanê, Kongreya




Netewî ya Kurdistanê (KNK) bi tevlîbûna hemû pêkhateyên çar parçeyên Kurdistanê, li bajarê Lozan ya Swîsreyê, kongreyek nîştimanî û mezin lidarbixe. Li ser vê mijarê endamê KNK'ê Şoreş Xidir axivî.
Şoreş Xidir da zanîn ku Peymana Lozanê, yek ji wan peymanên hemberî netewa Kurd û hemû pêkhateyên Rojhilata Navîn, ji aliyê dewletên dagirker ve hatiye îmzekirine. Şoreş Xidir got ku di salvegera sedsaliya vê peymanê de, dema hatiye Kurd dijî vê peymanê bibin xwedî helwest.
Xidir destnîşankir ku KNK projeyek netewî û nîştimanî weke erkek xwe dizane û wiha dom kir; "Bivê armancê em dixwazin di 22-24'ê Tîrmeha 2023'yan de li bajarê Lozanê kongreyek netewî ku pêkhateyên her çar pareçeyên Kurdistanê tevlîbibin, lidarbixin. Ji bo ku ev kongre bikeve rojevê, li ser asta her çar parçeyên Kurdistan û dervey welat, wê xebat bên meşandin. Em bang li hemû aliyên siyasî, kesayet, mamostayên zanîngehê dikîn ku di vê mijarê de xwedî gotin bin."
Di dawiyê de endamê KNK'ê Şoreş Xidir ragihand ku ewê bi alîkariya hemû kes û partiyên siyasî yên di nava KNK'ê de hemû astengiyan bişkênin û got; "Hêvîdarim em bikarin encamek baş bidest bixin. **ROJNEWS**


# Ji xewna welatekî serbixwe ber bi mîretiyeke malbatî ve

Kurdyar Dirê`î

Di dema dawî de girtina deriyê sêmalka dinavbera başûr û rojavayê kurdistanê de ketiye rojeva kurdan de, demildest de piropogenda hate kirin û rêvebriya xweser tewambar kirin û diyar kirin ku sedema girtina deriyê sêmalka ji ber wê yekê ye ku rêveberiya rojavayê kurdistanê rayedarên ENKS asteng kirine û destûr nedane wan ku di şahiya vekirina mûzexaneya berzanî de amade bibin û di peyre jî partî demoqratî Kurdistan eynî sedem nîşandaye û ji gelê rojavayê kurdistanê xwestiye ku li neçarîbûna wan têbighêjin û li himber rêvberiya rojavayê kurdistanê nerazîbûna xwe nîşan bidin . Heger mirov nerîneke ji rêzê li van sedeman binere wê bêje ji mafê PDK ye ku deriyê sêmalka bigre, yek bi yekê ye ? lê heger baş mijûl bibe û bi rame , buyer û geşedanên siyasî li beramber hev deyne dê baş bizanibe ku buhaneyên ji bo ENKS e maskeke rizyayî ye û pêkanîna bi hişê mirovan e .Girtina deriyê sêmalka ne girtineke weha ji rêzê ye û nejî ji ber wan sedemên ji rêzêne û ji bo ku em zelal bikin pêwistî bi diyarkirina hin xalan heye.

### Rewşa herêma Kurdistanê

Piştî salên dirêj ji şerê dinavbera îran û îraqê de (1980-1988) ku herdû dewletên cîran lawaz û têkçûyî ji hev geriyan, di îraqê de yên bûn qurbanî ji dawîlêhatina şer re gelê kurd li başûrê kurdistanê bû, ku rastî êrîşa çekên kîmawî ji hêla rêjîma bexdayê ve hatibû û kurd tarûmar kiribûn, di sala 1990 - 1991 de û piştî şerê kendavê yê yekemîn ku ji bo rizgarkirina Kiwêtê ji dagerkeriya bexdayê rûdabû,başûrê Kurdistanê li himber rêjîma bexdayê serî hildaye û bi navê raperîna 1991 hatiye nasîn, di encamê de koçberiya gel ya milyonî dest pê kiriye ber bi sînorên bakûr û rojhilatê kurdistanê ve, lewra û ji ber raya cîhanî ya giştî ve, di eynî salê de qedexeya rabûna balefiran li ser başûrê Kurdistan hatiye ragihandin ji hêla meclisa ewlehiyê ya girêdayî netewên yekbûyî ve, ev guhertinên ku çêbûn derfeteke zêrîn bû ji kurdên başûrê kurdistanê re ji bo avakirina herêmê lê belê mixabin herêma bi ewle wergeriya şerekî nav xweyî di navbera PDK û YNK de di 1994 de ku zêdeyî 5000 qurbanî ji pêşmerge û sivîlan hatin dayîn, di 1996 de dûbare şer dinavbera PDK û YNK de rûdaye û îran û îraq mûdaxele kirine ku bi hezaran ji herdû aliyan hatine infazkirin. Di 1997 de bi alîkariya tirkiyê PDK îrîşî PKK û YNK kir û bi hezaran qurbanî di vî şerî de hatin dayîn, di encamê de herdû partiyan PDK û YNK hevalbendên hev ji herêmên xwe qewitan din ta sala 1998 ku emerîka herdû alî li hev anîne û di




2007 de herdû partiyan serwerî li hev parve kirin. Di 2012 de serokê YNK Mam celal talbanî koça dawî kiriye û ji ber şerê bi dayîşê re di 2014 de aramî di navbera herdû partiyan de hebû, lê YNK di 2016 de peymana 2007 red kiriye ji ber ku PDK yek alî serweriya xwe li ser herêma kurdistanê kiriye, û di nava nakokiyan de PDK çûye rifrandoma serxwebûna başûrê kurdistanê: Di 2017 de û di encamê de Kerkûk û deverên bi nakok ji destê PDK û YNK derketin û herêma kurdistanê derbasî serdemeke têkçûnan bûye, ku di nava van buyer, nakokî û dûbarebûna têkçûnan de tirkiyê ji 1991 û ta roja îro baregehên leşgerî û destên xwe yên istixbaratî û siyasî û aborî berdaye nava herêma kurdistanê de û bi demê re xwe mayinde kiriye, bi taybet ku têkiliyên xwe bi PDK re dida pêş û nakokiyan istismar dike.

### Çima tirkiyê PDK hevalbend dibîne ?

Di serî de bîrdoziya tirkiyê ya bingehîn redkirin û tinekirina gelê Kurd û doza wî ya netewî ye û armanca sereke dagerkirina welatê kurda ne (mîsaqa milî ) pêkanîn e.

Tirkiyê her tim bi çavê tirsê li avabûna herêmeke fedral li başûrê kurdistanê dinêre û ticarî ew nepejirandî ye,lewra ew li dijî şerê kendavê yê duyemîn bû, alîkariya bi emerîka re li himber bexdayê red kiriye lê belê ji ber guhertina rewşên siyasî di deverê de û ketina rêjîma bexdayê di 2003 de û hebûna hêzên emerîkî di deverê de, metirsiya ji bilindbûna asta serweriya PKK di başûr de û teyisandina pêşketina hestên netewî li kurdistanê. Vê yekê hiştiye ku tirkiye têkiliyên xwe bi herêma kurdistanê re pêş bixîne. Tirkiyê têkiliyên siyasî, aborî û ewlehî daye pêş û him jî di navbera partiyên kurd de bi rola gurkirina nakokiyan radibe, ku her dem Tirkiyê weke parêzvanê tekane ji PDK re were nîşandan û her weha PDK li himber PKK bide bikaranîn û ji ber nakokiyên PDK bi YNKê û bexdayê re û metirsiya ji serweriya îranê û girûpên girêdayî wê di îraqê de, ji xwe re tirkiye weke hevalbendê herî bi ewle dibîne. Lê belê tirkiyê di avakirina têkiliyên xwe yên bi PDK re li armancin istiratîjîk digere, ne li hevaltiyeke rast bi başûrê kurdistanê re.

Ferzkirina serweriya xwe ya leşgerî,siyasî, aborî û çandî li ser herêma kurdistanê ku derfetê nebîne ji bo hewildanên avkirina dewleteke serbixwe. Rêgirtina li ber xwefirehkirina îran di herêmê de, piştî ku serweriya îran li ser îraqê diyar bûye. Veguhestina herêmê ji xwe re weke sûkeke bazerganiyê ku li gorî belgeyan rêjeya bazerganiya tirkiyê bi herêmê re gihiştiye 7 milyar dolaran. bê guman têkiliyên PDK bi tirkiyê re li ser bingehê berjewendiyên bazirganî û abûrî têye famkirin, lê belê dema ew têkilî dibin têkiliyên di navbera desthilatdarekî û mamûrekî de an jî hebûn û nebûna herêmê bi tirkiyê ve têye girêdan. Hingê jî serweriya herêmê ji wateya xwe dikeve û dimîne êsîrî tirkiyê. Tirkiye vê yekê dixwaze ku herêm di bin serweriya wê de be. Bi despêkirina buhara ereban re di 2010-2011 de û bilindbûna rola kurdan di Rojavayê kurdistanê de, tirkiyê têkiliyên xwe bi PDK re bêtir daye pêş, ku bibe garantî ji kontrolkirina hestên netewî re û kurdên Rojava bikşîne şerê li himber rêjîma Elesd û bibin beşek ji rikberiya girêdayî tirkiyê. Di eynî demê de PDK li hember tevgera azadiyê têxe tevgerê û di nava partiyên kurd de tevliheviyan derxe holê ta ku bi xwe ve mijûlbin. PDK ji ber rewşa xwe ya hundirîn û nakokiyên bi Bexda yê re. Imzekirina peymanên derxistina petrolê di nava axa tirkiyê re û girtina piştivaniya tirkiyê li himber metirsiyên ji guhertinên di deverê de, raste rast PDK ketiye lîska tirkiyê de, lewra avabûna ENKS û tevlêbûna wê di nava itîlafa sûrî de ji vê armancê hatiye ku ENKS destê PDK ê yê di Rojava de ye û li gorî ecendeyên tirkiyê tevdigere ji bo valaderxistina avabûna çi statûyeke kurdî di Rojavayê kurdistanê de. Heger PDK li ser bingehê hewcedariya bi tirkiyê re tevdigere û geriyayê û sûdeke hevbeş ji van têkiliyan dibîne, ev buhaneyeke derbasdar be û rastiya wê jî hebe lê tirkiyê van têkiliyan ji bo armancin mestir ava dike, ew jî rêgirtina li ber encamên piştî şerê bi DAIŞê re ye ku doza kurdî ne tenê li başûr û rojava, her weha li nava sînorê tirkiyê jî pêş bikeve û buhareke kurdî rû bide. Lewra giringe ku kurdan li himber kurdan bide xebitandin û di eynî demê de derfeta pêkanîna mîsaqa milî li ser lawaziya tevgerên kurdî û nakokiyên wan pêk bîne. Wê demê jî têkiliya bi PDK re ji tirkiyê re giringe û PDK bi demê re hatiye radestkirin ji tirkiyê re, bi taybet piştî rifrandoma serxwebûnê ya têkçûyî di 2017 de ku serokê tirkiyê Erdogan serokê herêma kurdistanê R.m berzanî bi xiyanetê tewanbar kiribû û heqareteke mezin li rêveberî û hişmendiya wan kiribû. Gefa fetisandina herêmê û derbeyeke leşgerî jî kiribû, lê belê dîsa jî Erdogan ew himbêz kirine weke kesayetin hewcedar û şikestî ku di xizmeta xwe de wan bikar bîne …..

**Di dome**

## Pêşeroja heremê ber bi ku ve diçe



Elî Roj

Hilbijartinên 14'ê Gulanê û encamên ku derketîn holê û encamên tûra duyemîn ji hilbijartinên serokkomariyê wê bandora xwe yekser li ser tevahî geşedanên ku li heremê diqewimin bike. Girêdayî vê yekê jî gef û êrîşên dagirkerên tirk û çeteyên girêdayî wê roj bi roj li ser gelê kurd di çarçoveya şerê qirkirina çandî û hişmendî de jî bê navber didomin. Li gorî ku tê xuyakirin wê AKPê her tiştî bike ji bona ku li ser desthilatiyê bimîne. Di serî de qadên berxwedanê, rojane bi çekên kîmyewî têne bombebaran kirin û şerekî giştî û ji hemû milî li ser gelê kurd tê meşandin. Êrîşên ku li ser Rojava, Bakur, şengal, girtina deriyê sêmalka û di dawiyê de jî dorpêça li ser wargeha Mexmûrê hemû girêdayî hevin û ji navendekî têne bi rêve birin. Dagirkerên tirk û çeteyên wê bi hevkariya PDKê dixwazin destkeftî û hebûna tevgera azadiyê di serî de li Rojava, Mexmûr û şengalê bê bandor bike û ger jê were ji holê rake. Ji bona pêkanîna vê yekê jî serî li hemû dek û dolaban dixin. Tecrîda li ser Rêber APO jî navenda van êrîşan e. Ji beriya êrîşên ku têne pilankirin Rêber APO dikin hedef û bi hincetên keyfî tecrîdê roj bi roj girantir dikin. Her weha qadên berxwedanê bê navber bi çekên qedexekirî tê bombarankirin. Li Rojava jî dagirkerên tirk û çeteyên wê bi hemû rêbazên gemar û qirêj, pêşengên tevgera azadî hedef digrin.

Wele din jî girêdayî rewşa sûriyê û aloziya ku tê jiyankirin, civînên çar alî jî yên ku qaşo bi navê çareseriya pirsgirêka sûriyê têne çêkirin, raste rast rêveberiya bakur û rojhilatê sûriyê û destkeftiyên wê dike hedef. Hikûmeta sûriyê jî her tim çavê wê ji derveye û bi danûsitandinên ku ji milê dewletên ereban ve têne meşandin, texmîn dike ku kêşeya sûriyê wê bi hesanî were çareserkirin. Ji ber vê yekê ji diyaloka sûrî – sûrî dûr disekine û hîn jî naxwaze rewşa heyî û guhertinên ku li sûriyê û heremê rûdane qebûl bike.

İnsiyatîfa rêvberiya xweser ji bona çareseriya pirsgirêka sûriyê û dengvedana wê li heremê û di qada nevnetewî de heyanî astekî cihê xwe girt. Lê ji milê hikûmeta şamê ve heyanî neha tu helwesteke ber bi çav nehatiye dîtin. Lê gotûbêjên ku li ser vê insiyatîfê têne kirin berdewamin û xwedî bandor in. Her weha insiyatîfa rêveriya xweser ji bona pêşwazîkirina welatiyên ku li Lubnanê bi darê zorê têne derxistin û yên ku li Sûdanê ji ber şer û pevçûnan asê mane xwedî dengvedaneke teybete û gelek aliyan ev insiyatîf erênî nirxandin.

Heremên ku ji milê dagirkerên tirk û çeteyên wê ve hatine dagirkirin jî rojane binpêkirin û kiryarên dij mirovî zêde dibin û ev yek jî li ber çavê cîhanê tevahî tê meşandin. Her çiqasî ku di nava saziyên navnetewî de Tirkiyê bi kiryarên xwe yên dijmirovî tê naskirin jî, lê heyanî îro ji bona vê yekê tu hewildanên ber bi çav ji bona dadgehkirina wê di dadgehên navnetewî de pêknehatî ye.

Di vê çarçoveyê de û li gorî encamên ku ji hilbijartinan derketî holê pêwîste ku ji hemû milî ve amedekarî û hazirî baş werin kirin û em xwe ji bona hemû guhertin û veguhertinên ku rûbidin hazir û amede bikin. Ji ber ku encamê hilbijartinê wê bandora xwe raste rast li ser Bakurê kurdistanê, Rojava û tevahî herêmê bike. Li hemberî van hemû geşedanên ku diqewimin, erkê me yê bingehî jî parastina destkeftiyan û azadiya fêzîkî ya Rêber APO pêkanîn e.



## PIŞTÎ HILBIJARTINAN ATMOSFEREK GIRAN LI BENDÊ YE!

Dilya Cizîrî

Tûreya duyemîn a hilbijartinên Tirkiyê ku çavên hemû cîhanê lê bû li gorî dilê hêzên nijatperest û xwînrijan bi dawî bû. Erdoganê ku xwe spart hêza dewletê û hemû saziyên wê xist xizmeta xwe û partiya xwe, ji bo 5 salên serokomariyê hate hilbijartin. Lijneya Bilind a Hilbijartinan îda kir, di hilbijartinan de tu kêşeyek bandorê li pêkanîna hilbijartinan bike, derneket. Lê li aliyê din dijberê Erdogan Kemal Kilijdaroglu got hilbijartin ne adil pêk hatin. Li aliyê din jî li gorî şopdar û çavdêran di hilbijartinên hatin lidarxistin de gelek xalên lawaz di pêkanîna hilbijartinan de hebû, alîgirên Erdogan gelek fen û fût pêk anîn. Ev jî tenî yek tiştî nîşan dide, ew jî zelaliya sîstema yekzilamî niha derketiya asta xwe ya herî bilind. Hêzên opozisyonê li Tirkiyê jî li beranberî wê pir lawaz û qelis hatiye hiştin.

Li aliyê din jî raste dibe hejmare perlementeran AKP/MHP'ê di perlemenê de kêm bûne. Lê ji ber em behsa sîstema yekzilamî dikin. Di nerîna min de ev yek wê tu cûdahiyek mezin bi xwe re neyîne. Ji ber wê jî çiqas mirov behsa astmosfera hilbijartinan û hîlebaziya tê de hatiye kirin bikin, Erdgoan li cihê xwe ma û sîstema xwe li ser her kesî feriz kir. Her kes niha mecbûre xwe li gorî mayîna Erdogan amade bike.

HDP'ê û Partiya Çepên Kesk peyama xwe ya bilindkirina asta tekoşîna demokrasiyê dan û helwesta xwe zelel eşkere kirin. Erdogan jî di daxuyaniyên xwe yên destpêkê de gefên xwe wekî berê xwarin û sozên xwe yên dijberiyê dûbare kirin. Çeteyên wî jî li herêmên me yên dagirkirî di roja hilbijartinan de bi gulebarînê û kuştinê kêfxweşiya xwe ya bi mayîna Erdogan re, nîşan dan. Zarokek jî bi guleyên wan jiyana xwe ji dest da. Me bi kurtasî behsa atmosfera pêkanîna hilbijartinan kir.

Lê ya ji wê girîngtir wê piştî hilbijartinan çi bibe? Wê êriş li dijî gelê kurd û bi taybet Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkevin çi astê? Ji xwe encamên wê beriya hilbijartinan bi girtina deriyê Sêmalka û dorpêça Artêşa Iraqê ji kampa penaberan a Mexmûrê re, diyar dibû. Ev nîşaneyên ber bi çav ên berdewama siyasetên Erdogan ên li ser xeta şer û kuştinê ne. Beriya niha êrişên wî ji bo hilbijartinan bû, niha wê ji bo ferizkirina planên xwe yên siyasî tevbigere. Ji lewma wê siyasetên xwe yên şer, êriş û kuştinê mezintir bike. Vê jî wê li Başûr, Rojava û Bakurê Kurdistanê liba bikin. Bê guman ev jî wê bi awayekî neyînî û mezin bandorê li aboriya Tirkiyê û jiyana xelkê jî bike.

Di vê atmosferê de di serî de ji gelê kurd, hemû hêzên demokratîk tê xwestin bi baldariyeke mezin xwe ji her rewşê re amade bikin. Bi taybet di vê demê de 24'ê Tîrmehê salvegera sedî ya Peymana Lozanê nêzîk dibe. Îcar bi hêsanî mirov dikare bêje wê salek giran li ser tavahî herêmê û li ser gelê kurd bi taybet derbas bibe. Nerîna min wê gelê me jî li gorî ezmûn û tecrubeyên xwe yên demdirêj, ji hemû rewşan re bibe bersiv.



# Salih Muslim: Tirkiye dikeve qonaxeke tarî

Salih Muslim destnîşan kir ku faşîzma AKP/MHP'ê bi rêbazên qirêj û tifaqa li gel mafya, Hîzbûlahê di hilbijartinan de serkeftî xuya kiriye, lê ji hundirve hildiweşe û wê bikeve qonaxeke tarî. Muslim bal kişand ku Kurd tevî hemû êrîşan serkeftî bûne û mînaka xweparastin û pêşengîtiya têkoşîna demokrasiyê careke din nîşan daye.

Hevserokê Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Salih Muslim derbarê encamên hilbijartinên li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê û tifaqa AKP/MHP/Hîzbûllah de ji Ajansa ANHA'ê re axivî.

Salih Muslim hilbijartin weke "Hilbijartineke bêadalet" penase kir û got: "Di her alî de êrişên dewletê li dijî gelê Kurd çêbûn. Bi vê hilbijartinê deshiladariyê dixwest Kurdan tine bike, ji hole rabike. Dixwest êrîşên 8 salên dawî yê li Kurdistanê bigihîne encamê, lê wekî wan dixwest çênebû."

Muslim bal dikişand ku Kurd di hilbijartinan de serkeftî ne û ev nêrîna xwe wiha rave kir: "li dijî hemû êriş, zext û sextekariyan Partiya Çepêk Kesk 61 parlamenter şandin meclîsê. Ji van parlamenteran 31 jin in û ev bi xwe serkeftineke mezin e. Xwe parastin û di meclîsê de bûn partiya sêyemîn. Di demên pêş de wê ev serkeftinên gelê Kurd ji bo tevahiya jinan û hêzên azadîxwaz ên li Tirkiyeyê bibin sedema lixwe vegerandinê. Kurdan ispat kiriye ku dikarin xwe biparêzin û pêşengiya têkoşîna demokrasiyê bikin."

### `Diviyabû gelê Tirkiyayê rabûbaya ser piyan'

Hevserokê PYD`ê Salih Muslim destnîşan kir ku divê gelên Tirkiyeyê ji bo jiyaneke hevbeş û demokratîk xwe ji nexweşiya



şovenîzmê xilas bikin û wiha dom kir: "Me digot belkî Tirkiye ber bi demokrasiyê ve biçe û hebûna Kurdan qebûl bike. Lê di hilbijartinan de jî xûya kir ku şovenîzm bûye perçeyek ji laşê wan. Herî kêm diviyabû gelê Tirk li hemberî tiştên li Tirkiyê di aliyê siyasî, civakî, aborî de çêdibin rabibûya ser piyan."

### `Dewlet ket destê mafiya, Hîzbûlah û çeteyan'

Muslim, destnîşan kir ku tifaqa AKP/MHP ya bi Hîzbûllahê re wê li ser gelê Kurd xeteriyên mezin çêbike, lewma divê gelê Kurd baldar be. Muslim anî ziman ku dewleta Tirk bi temamî ketiye destê mafya, Hîzbûllah, çeteyan û wiha berdewam kir: "Li aliyekî hêzên demokrasîxwaz û gelê Kurd li aliyê din çeteyên gemar heye. Li Rojavayê Kurdistanê DAIŞ bi ser me de şandin. Li Bakur jî Hîzbûllah dikin belaya serê gelê Kurd. Hûda-Par, baronên madeyên hişbir û mafya xwe li derdora Erdogan kom kirin û hiştin desthildarî bidome. Wê Tirkiye têkeve qonaxeke tarî û kes nizane wê bi ku de biçe. Ji ber ku dewlet ketiye destê mafya, çete, Hîzbûllah."

### 'Afganistana nû'

"Li Rojava divê em hesaba xwe bikin ku Afganîstan bûye cîranê me" bi van gotinan Salih Muslim Tirkiye wekî Afganîstanê nîşan da û wiha behsa xeteriyan kir: "Siyaseta AKP/MHP ya li dijî Bakur û Rojhilatê Suriyeyê xûya bû, wê vê siyaseta xwe berdewam bike. Ji destê wan were wê hîn êriş bikin. Xeteriya vê desthiladariyê li ser Rojhilata Navîn giştî jî heye. Wê çeteyên di deste xwe de bihêz bikin û li ser wan siyasetê bimeşînin. Lê dewleta Tirk ji hundir ve hildiweşe. Di aliyê aborî, siyasî û dîplomasî de îflas kiriye. Hêzên navnetewî wê ji êrişên wan re nebin alîkar. Kes tine ye ku li kelêka siyaseta Erdogan bisekine. Lê divê em tedbîrên xwe bigirin, em ne li bendê ne ku kesek were parastina me bike. Gelê me erkek dîrokî û pêşengtiyê li Rojhilata Navîn girtiye ser xwe û wê bidomîne."

## Ne bi hilbijartinê Erdogan bi hêza dewletê li ser desthilatdariyê ma



Zekî BEDRAN

Li Tirkiyê tura duyemîn a hilbijartinan xilas bû. Li gorî daxuyaniyan Erdogan ji sedî 52 bi ser ket. Di vê rewşê de dê aliyê Erdogan û Baxçelî dê 5 salên din Tirkiyê bi rê ve bibe. 21 salên ku Erdogan li ser desthilatdariyê mayî tu pirsgirêkên Tirkiyê çareser nekirin. Li ser bingehê dijminahiya Kurdan demokrasî hilweşandin û ne edalet ne jî aborî li holê nema. Êrişên dagirkeriyê yên li ser Sûriye û Iraqê, qirkirina li ser Kurdan Tirkiyê xiste nava çiravê de. Niha jî dibêjin ku dê polîtîkayên şer û dijminahiya li dijî Kurdan bê navber bidomînin.

Bêguman dê encamên hilbijartinê hîn zêdetir bên nîqaşkirin. Di rastiyê de hilbijartineke ku weke hilbijartinekî asayî nehat kirin. Eger AKP û Erdogan di mercên asayî de beşdarî hilbijartinê bibûna, ne dikarîn bibin desthilat ne jî dikaribûn nîva dengê ku standine bistînin. Ka bifikirin, eger AKP jî weke CHP'ê û partiyên din bê alîkariya derfetên dewletê, di mercên wekhev de beşdarî hilbijartinê bibûya dê çi çêbûya? Partiyek bi navê AKP'ê jî nedima. Me di nirxandinên xwe yên li ser hilbijartinê de hertim got, li aliyekî partiyên muxalefetê li aliyê din jî dewlet beşdarî hilbijartinê dibe. Erdogan tevahî pîvanên exlaqî û hiqûqî dan aliyekî, tevahî derfetên dewletê bikar anî û beşdarî hilbijartinê bû.

Tevahî hêzên tarî û paşverû yên Tirkiyê di bin navê hilbijartinê de operasyonek birin ser muxalefetê. Kampanyayek balkêş a reşkirin, provekasyon, derew ku xwe dispêre demagojiyê dan meşandin. Bi dijminkirin, vederkirin û zextê hewl dan muxalefetê bêbandor bikin. Kesên weke Umît Ozdag û Sînan Ogan bi kar anîn û derdora siyasî jirê derxistin. Endamên xwe yên şerê taybet kirin belaya serê muxalefetê. Bi kurtahî bi operasyoneke ku navê hilbijartinê lê kirinbûn dest danîn ser desthilatê. Eger vê hilbijartinê rewa, adil û wekhev bibînin dê bibe jirêderketineke mezin. Ji derveyî vê li gel tevahî komplo, gef û zextan jî Erdogan tenê ji sedî 52 deng girt! Dema em fêlbaziyên hatine kirin, dizîna dengan û hîn gelek lîstokên ku derneketine holê bihesibînin, dê bê dîtin ku piraniya gel Erdogan naxwaz e. Kesên faşîst ên weke Sînan Ogan bi lîstok û komployan gotin ku me Kurd di polîtîkaya Tirkiyê de bêbandor kirin. Herkes dizane ku, eger Kurd nebûna muxalefetê bajarên mezin ên weke Stenbol û Enqere qezenç nedikirin. Standina şaredariyên van bajarên mezin ji desthilatê bû derbeyek mezin. Ji ber ku, dema Erdogan hilbijartin qezenç kir weke armanc girtina Stenbolê danî pêşiya xwe. Ev yek şikestina wan û encamên derketine holê nîşan dide. Dema ku muxalefetê şaredarî girtin baweriya wan a bi xwe zêde bû, zindî bûn. Kurdan nîşan kirin ku ew didin qezençkirin û windakirin. Di vê hilbijartinê de jî yên herî rastî zextê hatin dîsa Kurd bûn. Divê tevahî muxalefet êdî vê rasiyê bibîne û bipejirîne; gelê Kurd pêşeng û motora demokrasiyê ye. Dema ku qayûm diavêtin şaredariyên HDP û kesên hilbijartî diavêtin girtîgehan, divê muxalefetê ev êriş weke ku li wan û demokrasiyê hatine kirin bidîtiba. Kurd li Tirkiyê hêza bingehîn a demokrasiyê ne. Zext û êrişên li ser Kurdan ne tenê li Kurdan tên kirin, li dijî tevahî Tirkiye û demokrasiyê tên kirin. Zext û bêmafiyên li dijî Kurdan teqez demokrasiya Tirkiyê lewaz dike. Binê lingê muxalefetê vala dike. Kesên ku temaşeyî zextên li dijî Kurdan dikirin, dema dor tê wan di bin de dimînin.

Dema ku HDP'ê ragihand dê piştgiriyê bidin Kiliçdaroglu hinek derdoran got ev xelet e. Hinekan jî propoganda kirin ku bi dengê Kurdan çepên Tirk dişînin meclisê. Yên dewleta Tirk rêve dibin, AKP û MHP dixwazin Kurdan ji gelê Tirk qut bikin û hewl didin Kurdan bitenê bihêlin. Me di pratîkê de jî dît ku eger li Tirkiyê demokrasî pêş bikeve dê Kurd henaseyekê bigirin. Ji bo pêşketina demokrasiyê jî pêwîste bi hêzên demokrat re bibin yek û hêz bibin hevdû. Tifaqên demokratîk avakirin ne xelet e, berovajî hîn zêdetir pêwîste û divê bên bihêzkirin. Eger Kurd çend parlementeran zêdetir bişînin meclisê dê çi biguhere? Erkê sereke li Tirkiyê mezinkirina demokrasiyê ye. Eger wisa be hem dê Kurd, hem jî tevahî Tirkiyê qezenç bike. Xeta rast ev e. Pêwîst nake serê gel tevlîhev bikin û dudiliyê ava bikin. Ji ber ku careke din Erdogan anîn ser desthilatê, cîhan nesekinî ye. Jiyan û têkoşîn berdewam dike. Her ku têkoşîna demokrasiyê bi hêz bibe dê faşîzm hêzê winda bike û binbikeve. Di vî alî de pêwîste Tifaqa Ked û Azadiyê bihêztir bibe û yekîtiya hêzên Kurdistanî bidome.



## Sembolê Serkeftinê 'V'

Farûk Sakik

Sembola serkeftinê 'V' çîrokek xwe heye. Di sala 1415'an de di navbera Fransa û Îngilizan de şerê "Agincourt" pêk tê. Di vî şerî de dema leşkerê Fransî li hember Tîrvanên Îngilizan bi ser nakevin, ciwanên tîrvan digirtin û tiliyên wan ên ku pê tîr davêtin ango tiliya îşaret û navîn jêdikirin. Yên ji wan difilitîn ji dûrî ve wan her du tiliyên xwe yên tîravêjê 'V' bilind dikirin. Ev yek ji wê serdemê hetanî roja me hatiye. Bi taybet piştî ku di Şerê Cîhanê yê Duyem de jî Wiston Cruhchill, ev sembol wek peyva Vîktoriy-serkeftin 'V' li hember Naziyan bi kar anîbû.

Ev sembol li cîhanê belav bû. Bi taybetî li Kurdistanê li hemberî dijmin ev sembol tê bikaranîn. Di heman demê de li Kurdistanê ji zarokan bigire heta mezinan bi vê sembolê serkeftina xwe sekna xwe ya li hemberî dijmin nîşan didin. Dijmin dema vê îşaretê dibine har dibe. Bi taybetî tiliyên zarokan li qeraxê reyan li hemberî panzêr û eskerê dijmin bilind dibin, dijmin min jî wek ku gerîla derketibe pêşberî wan dîn dibûn.

Di sala 1992'yan de dema ez li Mûşê rojnamevan bûm, rojek min xeber girt ku du gerîla şehîd bûne û anîne nexweşxaneya Mûşê. Ez çûm morgê min dît yek ji wan hevalê min bû,Remo bû. Çavên wî şîn bûn. Di salên zindanê de Tevgera Azadiyê naskir û biryar da bû gerîla.

Dema min li cenazeyê wî nêrî, min dît berî bombe di bedena xwe de biteqîne bi dest rastê îşareta serkeftinê kiriye û herdû tiliyên wî wisa 'V'mabûn.

Îro jî li Kurdistan ev herdû tiliyên sembola serkeftinê her tim bilind dibin. Min ê ev nivîs di 15'ê Gulanê de binivîsiya, lê li benda serkeftina duyem a 28'ê Gulanê mam, nebû. Erdogan ji nû de wek serokkomar hat bijartin. Lê Kurdan di 14'ê Gulanê de serkeftinek bidestxistibûn. Li benda serkeftina desthilatdariya Erdogan birûxînin bûn. Kurdan erka xwe pêk anîn, li Kurdistanê dengek baş bidestxistin. Lê qelsbûna mixalefetê emrê desthilatdariya Erdogan 5 salên din dirêj kir. Ji bo vê yekê herdû tiliyên Kurdan wek tîrvanên Îngilizan bilind in.

Dewleta Tirk a dagirker bi salan e li Kurdistanê polîtîkayên qirkirinê dimeşîne lê bi ser nakeve. Berxwedana li hemberî van polîtîkayan bi serê xwe serkeftineke mezin e.

Erdogan piştî ku hat hilbijartin di axaftina xwe ya yekem de dîsa Kurdan hedef nîşan da. Li hemberî Kurdan bi kîn û nefret tevgeriya.

Erdogan bi wê axaftina xwe startê hilbijartinên xwecihî yên deh meh şûnde da destpêkirin. Di kampanya vê hilbijartinê de wê stratejiya hilbijartina 14'ê Gulanê esas bigire. Ev stratejî li ser dijminatiya Kurdan û şer hatibû avakirin.

Erdogan dît ku ev stratejî pere dike û ji bo vê yekê wê di van 10 mehan de dozaja vê dijminatiyê zêde bike.

Di axaftina xwe de peyvên, Qendîl, Rojava, Qamişlo, HDP, Qeyyum, Selo bi kar anîn û îşaretên siberojê dida. Talûkeya herî mezin, wê êrişên li ser HDP û parlementerê çûne Meclisê zêde bibin. Der barê wan de doz werin vekirin ji parlementoyê werin derxistin, partî werin girtin. Bi van kiryarên xwe wê bibêje wiha min Meclis ji PKK'ê paqij kirin. Ev yek di civaka Tirkiyê ya ku me di 28'ê Gulanê de nas kir wê bersivek bibîne.

Çi dikin bila bikin, wê Kurd ji hemû êrişan bi serkeftin derkevin. Wê tu carî teslim nebin û li hember planên wan, wê wek şahîd gerîla Remo herdû tiliyan wan wê bilindkirî bin.